

Rejîma Îranê Çalaktirîn Piştevanê Terorîzmê Ye



Wezareta Karên Derve a Amerîkayê di rapora xwe a salane de cardin rejîma Komara Îslamî a Îranê weke çalaktirîn piştevanê terorîzmê di cîhanê de nasand. Di raporê de tevî îşare kirin bi Hêza Quds a Sipaha Pasdaran weke serekîrîn bask û alava rejîmê bo piştevanî ji terorîzmê li derveyî welat de hatiye ku: "Hêza Quds weke beşa operasyonên derveyî yên Spaha Pasdaran ji sedemên sereke yê pêkhatin û piştevaniya terorîzmê tê hesabandin".

Dîsan daye zanîn ku Îran bi piştevanî kirin ji girûpên çekdar yên Rohhilta Navîn, rolek berbiçav li nêrâmî û aloziyan li deverê de heye û bi vî karê xwe bandor û karîgeriya nerênî a rasterast li ser hewlên navnetewî ji bo bihêzkirina aştîyê dike û tenahî û seqamgîriya aborî li Dûrgeha Fars de berbirûyê metirsiyan dike û zirarê dide geşandina demokrasîyê.

Rapor herweha îşare bi perwerdehî û tayar kirina endamên Taliban, girûpên çekdar yên şîî li Îraqê, girûpên tundajo yên Felestinî û Hizbulaha Lubnanê ji aliyê rejîma Îranê û baskê operasyonên derveyî yên welat (Sipaha Quds) dike. Ji hêla din ve jî rapor dewleta Sûriyê bi hevkarîkirin digel Îranê bona şandina çek û pere bo girûpên Felestinî û Hizbulaha Lubnan tawanbar dike.

zarokên azadbûyî yê girtîgehên
tirkiyê tûşî nexweşiyên piskolojîkî
bûne



Du çalakên jin ên Îranê xelata mafê
mirovan a Hilmen-Himêt wergirtin



Rûpel 2

daxuyaniya
deftara
siyasî ya
pdkî



Rûpel 4

Qasimlo
ê
pêşmerge



Ebdulla Hicab

Rûpel 6



Komara Îslamî Li Dewsa
Rejîma Sedam de Diherike

Arîn

Rûpel 8



Turkiye Di Dema
Desthilatdariya AKP'ê De

Şakir Molayî

Rûpel 9



Telaq, diyardeyek ku gefê ji
civaka Îranê dixwet
Ceifer Mubeşirniya

Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDKÎ Bi Hilkevta Koça Dawiya Mamosta Şêx Celal Husênî

H ewelatîyên rêzdar!
Civatên xelkê Kurdistanê!
Bi xem û keserekî zêde, roja 21'ê

Tîrmeha 2010'an, mamosta Şêx Celal Husênî, welatparêz û xebatkarê mandînenasê Kurd, avakerê Saziya Xebata Kurdistanê Îranê, bi sedema nexweşiyê di yek ji nexweşxaneyên bajarê Hewlêrê dilê wî yê pir ji evîna Kurdîniyê ji lêdanê ket û bo hertim xatirê xwe ji xebatkarên Kurdan xwast.

Mamosta Şêx Celal Husênî, kesayetiyeke naskirî e Kurd bû ku piraniya temenê xwe bo Kurdîniyê û xebat bo dabînbûna mafên netewî yên gelê Kurd li Kurdistanê Îranê terxan kir û her bi sedema Kurdperweriyê ve di serdeme rejîma Pehlewî de hat zindankirin. Mamosta Şêx Celal wek mamostayekî olî gelek qutabî di mizgevtên Kurdistanê de elemendiye û ji wan re basa pîrsa Kurdan kiriye Navhatî di xebata gelên Îranê de bo hiloşîna rejîma Pehlewî



çalakane beşdarî kir û rolek girîng hebû. Bi hatine ser kara rejîma Komara Îslamî a Îranê bi sedema pêdagirtina wî li ser daxwazên berheq ên gelê Kurd ket bin çavdêriyê û çepera wî li bajarve bo çiya hat veguhastin, di

vê dawiyê de jî li nîzik bajarê Hewlêrê di Herêma Kurdistanê de akincî bi bû. Ji destçûna mamosta Şêx Celal Husênî xesarek mezin bû bo bizava Kurd û kovaneke bû bo hemû têkoşerên rêya azadiyê.

Deftera Siyasî ya PDKÎ, tevî nişandana hevxiyê xwe behî û serxweşiyê ji Komîteya Navendiya Sazmana Xebata Kurdistanê Îranê û mamosta Şêx Îzedîn Husênî û BabeŞêx Husênî û hemû endamên malbata xwedê lîxweşbûyê jêrazî û xwe di xema ji destçûna mamosta Şêx Celal Husênî de bi şîrîk û hevxiyê dizane û sebir û aramiyê bo hemû aliyekê bi hêvî dixwaze.

Cihê wî buheştê berîn be û rêya gihîştin bi xweziyên wî pir rêvîng be.

**Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê
Deftera Siyasî
22'ê Tîrmeha 2010 'a Zayînî
31'ê Pûşpera 1389 a Rojî**

Zarokên azadbûyî yê girtîgehên Tirkîyê tûşî nesaxiyên piskolojîkî bûne

Y ek ji berpîrsên Civata Mafên Mirov li Tirkîyê ragihand ku, zarokên ku di girtîgehên dewleta

Tirkîyê de azad bûne, tûşî nexweşiyên piskolojîkî bûne.

Necdet Îpek Yûz , endamê Şewra Birêveberiya Civata Mafên Mirovan li Tirkîyê di gotebêjekê de tevî "Aknews"ê, derheq rewşa piskolojîkî a zarokên kurd ku di wê dawiyê de ji girtîgehê azad bûne, ragihand ku ew zarok li girtîgehê de di nava rewşên dijwar de jiyane, bi wan re bi şewaz û metodên xirab riftar hatiye kirin û ketine jêr îşkencên piskolojîkî û fîzîkî.

Îpek Yûz herwiha ragihand ew hemû ew zarokên ku bi tomata beşdarîkirin di xebatêntirorîstîde hatibûn girtin, bi tewahî nehatine berdan.

Ji dîtina hinek kesan, bi azadkirina hinek zaroka jî girtîgehê, giştî pîrs hatine çareser kirin û tu pîrsek nemaye.

Wî herwiha domand: Zarokên ku ji girtîgehê azad bûne, bi bihîstina dengê bêsîma hêzên ewlekarî, dîtina polîsan û bihîstina nûçeyên derheq girtîgeh û girtiyan tûşî tîrs û dilkutok û strêse dibin û li warê derûnî ve têk diçin. Lewra mirov nikare bibêje ku her tişt bidawî hatiye.

Dr. Îpek Yûz herwiha zêde kir ku Civata Mafên Mirov bi alîkariya Navenda Birêveberiya Dadweriyê ji bo Zarokan, raporek di warê rewşa piskolojîkî û fîzîkiya ew zarokên Kurd ên ku ji girtîgehê azad bûne, amade kirine û dê bona baştirkirina rewşa wan a hundirîn hewlê bidin.

Du çalakên jin ên Îranê xelata mafê mirovan a Hilmen-Hemtê wergirtin




Saziya Çavdêrên Mafê Mirovan, nawê **Perwîn Erdelan û Azîn Îzedifer**, du jinên Îranî tevî 40 nivîskar û rojnamevanan di welatên cur bi cur ên cîhanê de weke serkevtiyên xelatê Navnetewî a "**Hilmen-Hemt**"ê, di sala 2010'an de nasand.

Xelata **Hilmen-Hemt** di sala 1990'an, ji bo bîranîna **Nilyan Hilmen**, şanonivîsê Amerîkî û hevala wê **Dişil Hemt**, romanivîsa Amerîkî, ava bû. Ev xelata bi wan nivîskaran tê bexşin ku seba nişandana nêrînên cuda û rexnekirina desthilatdar û karên hikûmetî tîen cezakirin.

Perwîn Erdelan rojnamevan, çalaka mafê mirovan û yek ji pêşengên Kempeyna Yek Milyon Îmzayan e ku di sala 2007'an de ji seba çalakiyên xwe di warê mafên jinan de xelatê **Olaf Palmê** li Swêdê bidest xist. **Azîn İzedifer** jî wergêr û nivîskar e, ew herwiha hevkarê Saziya Lêborîna Navnetewî bûye.

Di sala 2009'an de Mihemedsedîq Kebûdwend, Asiye Emînî û Yusuf Ezîzî Benîturuf tevî 33 kesên din ku yê welatên cur bi cur ên cîhanê bûn, xelata Hilmen-Hemt bidest xistin. Hûşeng Gulşîrî, Teqî Rehmanî, Elîşref Derwîşîyan û Şehram Refîqzade ji serkevtiyên salên borî ên xelata "Hilmen-Himê"ê, bûn.

Di bûyêrek tirafîkê de dilsojêkî PDKÎ canê xwe ji dest da



Roja 27.07.2010'an seba wergeriyana tîrombêlê li devera Kanîsîpî a ser bi Deştêbêla bajarê Şînoyê de, **İsa Nebîzade**, kurê Hesen, xelkê gundê Delo a devera Dolê a Urmîyê li temenê 55 saliyê de koça dawiyê kir.

Navhatî mirovekî niştîmanperwer û mala wî jî li serdemê xebata çekdarî a PDKÎ de cihê vehewiyana hêza pêşmergekê Kurdistanê bû. Du biraziyan kek İsa bi navên Kemal û Celal Nebîzade şehîdên PDKÎ ne. Herweha niha xortek wî jî bi navê Hikmet Nebîzade, Pêşmergeyê partiyê ye.

PDKÎ serxweşiya xwe pêşkêşî malbat û kes û karên kek İsa û devera Dolê dike û xwe bi şîrîkê xema wan dizane.

Gefxwarina hêzên rejîma îranê bona çekdarkirina xelkê gundeke bajarê Selmasê bêncam ma

Çend rojan berî niha, hejmarek ji fermander û berpîrsên Sipaha Pasdaran û Îdareya Ewlekariya bajarê Selmasê, çûne gundê Herekiyanê û gef ji xelkê wî gundî xwarine ku dibe çeka rejîmê hilbigirin yan jî wî gundî vala bikin.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de da xûya kirine ku, xelkê wî gundî dijî wê gefa hêzên rejîmê helwêst ji xwe nişan dan û dan zanîn ku ne çeka rejîmê hildigirin û ne jî gundê xwe vala dikin û di gundê xwe de mjûlê dabînkirina bijîva jiyana xwe ji rêyek helal de dibin. Hêjayî gotinê ye, hêzên rejîmê dema ku helwêsta xelkê wî gundî bi vî awayî dîtî, wir bi cî hiştin.

Daxuyaniya Deftara Siyasî a PDKÎ bi hilkevta bidawîhatina Piînomaya Nehan

Em hemû aliyek haydar dikin ku 9'min Piînomaya Komîteya Navendî a PDKÎ, hilbijartiya Kongireya 14'hem,

demjimêr 9:30'ê roja 30'ê Pûşpera 1389'ê Rojî, hemberî 21'ê Tîrmeha 2010 a Zayînî, bi beşdariya endamên eslî, cigirên Komîteya Navendî, cigirê berpîrsê peywendiyên partiyê li derveyî welat û nûnerê partiyê li welatê Amerîkayê dest bi karê xwe kir û piştî du rojan karê berdewam, roja 22'ê Tîrmehê bi dawî hat. Piînomê bi ragirtina deqçeyek bêdengî bo rêzgirtin ji 21'emîn salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo û şehîdên Viyenê û hemû şehîdên rêya azadiyê dest pê kir.

Piştî pejirandina destûra karê piînomê, Sekreterê Giştî ê PDKÎ Mustafa Hicrî, raporeke siyasî li ser wan guhertinên ku di navbera piînomên 8 û 9'ê de li Îranê û deverê qewimibûn, pêşkêşî beşdarên piînomê kir û pêdeçûn bi ser wan biryaran kir ku di piînomê 8'an de hatibûn pejirandin û çavaniya birêveçûn û biencam gihîştina wan jî hatibûn destnîşankirin.

Di beşeke din a karê piînomê de Cigirê Sekreterê Giştî, Hesen Şerêfî raporek li ser memûriyeta çend mehiye xwe bo derveyî welat û kar û çalakîyên ku di vê heyamê de encam dabûn, tevî nîrxandinek li ser kar û barên partiyê li derveyî welat û rewşa opozîsyona Îranî, Kongireya Netewên Îrana Federal û peywendiyên partiyê tevî Enternasyonal Sosyalîst û rêxistinên navnetewî û raya giştî a derveyî welat di derbarê rewşa Îranê û cih û pêgeha Kurd di vê beşê de pêşkêşî piînomê kir.

Herwiha di beşeke din a bernamaya karê piînomê de, Şerîf Bêhrûz nûnerê partiyê li Amerîkayê, tevî baskirin li ser peywendiyên



PDKÎ û dewleta Amerîkayê rapora komîteya kar û barên partiyê li derveyî welat pêkêşî beşdarên piînomê kir.

Di rapora siyasî a Sekreterê Giştî de, dirûstiya helwêsta partiyê li hember hilbijartina dehemîn gerra Serok Komariyê li Îranê û encamên wê û ew pêşbîniyên ku di vê peywendiyê de di piînomê 8'an de hatibûn kirin, tekez li ser hatibû kirin. Ev rapore bi libarçavgirtina rewşa siyasî ya niha a Îranê û kirîzên hundirî û navnetewî ku rejîm tevî wan berbirû bûye û ev givaşên aborî ên ku piştî derkirina çaremîn biryara civata tenahî a ser bi Rêxistina Netewên Yekgirtî û dorpeçên yekalî ên çend welatan ketiye ser rejîmê, pêşbîniya vê yekê tê kirin ku rejîm tevî rewşeke xirabtir berbirû bibe. Eva jî di demekê de ye ku vê raporê bi hejarî û bêderfeti û bilindbûna astê bêkariyê, domandina siyasetên tepeserkirin û pêkanîna zor û givaşan bo ser xelkê jî aliyê rejîmê ve heya beriya hilbijartinan jî îşare hatibû kirin. Wê raporê piştigirîya PDKÎ jî bizava siyasî û Sekular a xelê, dubare kiribû ku armanca vê xebatê bo azadî û demokrasî û dabînbûna

mafên netewî ên netewên Îranê ye, vê raporê girîngiyêke taybet dabû girevgirtina xelkê Kurdistanê di meha Gulana îsal de ku li ser gaziya partiyên siyasî ên kurd bi encam gihîşt. Rol û bandora kurd di asta netewî, deverî, Îranê û di nav hêzên siyasî ên opozîsyona Îranê de wek tevgerêke cemarêrî zeqîr kir û di 22'ê pûşpera îsal de jî ciwanên Kurd li Kurdistanê Îranê û li derveyî welat carek din emegdariya xwe bi rê û rêbaza Dr. Qasimlo û PDKÎ nîşan dan.

Di beşeke din a rapora Sekreterê Giştî de, îşare bi rewşa kurd li hemû parçeyên Kurdistanê hatibû kirin û rewşa welatên deverê, bi taybetî Turkiyê û Îraqê ketibû ber bas û herwiha îşare bi hewlên Komara Îslamî a Îranê bo têkdana rewşê û tevlihevîkirina tenahiya deverê hatibû kirin.

Di vê raporê de kar û tekoşîna partiyê bi giştî di navbera du piînomên de kete ber bas û îşare bi pêşveçûna karan di warên ragihandina rêxistinî, peywendiyên û rêxistinên senfî û sivil hatibû kirin.

Di beşa dawîn a karê piînomê de, pêşniyara Komîsyona Siyasî – Nîzamî li peywendî di gel çavaniya birêveçûna konferansên Navend û komitayên teşkilata eşkere kete ber bas û hate pejirandin.

Beşdarên piînomê dîtî û nerînên xwe li ser raporê nîşan dan û piştî pejirandina wan, komek raspare bona baştir bi rêveçûna karan di Deftara Siyasî a partiyê de hatin pêşkêşkirin. Piînomê ewariya roja Pêncşemî, 22'ê Tîrmehê bi dawî hat.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê Deftara Siyasî 31'ê Pûşpera 1398an a Rojî 22'ê Tîrmeha 2010'an a Zayînî

Cinayetek ku nahê ji bîr kirin



Nûredîn Sofizade

Sala 1367' ê Rojî bi liberçav girtina rewşa welat, piştî pejirandina biryarnamaya 598 a Şêwra Ewlekar a Saziya Netewên Yekbûyî derheq qebûlkirina agirbenda şerê di navbera Îran û Îraqê de û vexwarina

cama jehrê ji aliyê Xumênî ve, Komara Îslamî bo çavtirsandin û matkirina dengê nerazîbûna xelkê welat û bixasmanî dijberan, pîlan û nexşeyek gelek hovane darêt. Ew cinayeta jibîmekirî jî kuştara bikom a girtiyên siyasî bû ku Xumênî li futwayekê de fermana kuştina hezaran kes ji xortên siyasî ên Îranê di girtîgehên xwe de bi celadên xwe re ragihand. Xumênî di wê nameya xwe de ku roja 6'ê Gelawêjê ji bo hemû dadistanan welat şandibû, têde biryara pêreghîştina micid bo dosyayên girtiyên daye û di wê nameya wî de hatiye. Kesên ku di girtîgehên seranserî ên welat de li ser helwesta dujminkarane û binîfaq a xwe rîjd û pêdagir in, mehkûm bi îdamê ne û diyarîkirina wan jî ji aliyê Hucetolîslam Nîyerî, dadgerê Şerîf, Eşraqî Dadistanê Tehranê û nûnerê Wezareta Îtîlaatê bihê encamdan. Ewa bû ku deriyên girtîgehên bi tewayî hatin daxistin, telefon

hatin qutkirin, seredanên takekesî û karê girtiyên hat qedexekirin, anîn û birina nameyan hat rawestandî, radyo û televîzyon hatin temirandin û ...

Piştî wê futwaya Xumênî li hemû girtîgehên de darên îdamê hatin çeqandin û rojane bi dehan û sedan xortên wê av û axê diçûn bin darê îdamê. Pêka serhejmarîyên ku heya niha hêzên siyasî ên dijberî rejîmê veşandine, navê 4484 kes ji girtiyên siyasî ên ku li havîna 1367 a Rojî de îdam kirine, hatiye tomar kirin ku bêguman gelek ji wê hejmarê zêdetir in û meznatiya wê cinayetê ewqas e ku renge aliyên veşartî yê wê heya dehan salên din jî nehên eşkerekirin.

Komîsyoneke 3 kesî pêkhat ku erkê wan diyarîkirina qeder û çarenivîsa wan girtiyên bû û ji wan re digotin ka tu dê bimirî yan bijî? û çend pirsyarên gelek sade ji girtiyên dihatin pirsîn weke, tu misilmanî? te bawerî bi Xwedê heye? te bawerî bi Buheşt û Cehnemê heye? Tu nimêjan dikî? Tu rojiyan digrî? Yan nûnerê îtîlaatê, Mistefa Pûrmihemedî ji wan girtiyên dipirsi, te ew partiya ku tu têde endamî, qebûl e? Te Komara Îslamî qebûl e? Tu kadroyê çî partiyekê bûy? Şihade kelîma xwe bîne û ...!

Belê wiha hêsan qedera mirovan dihatê diyarîkirin ka dê bijî yan jî bimre. Pîlana îdamê dest pêkir heya destpêka meha



Sermaweza 1367' ê tu yek ji malbatên girtiyên zanyariyek li ser kes û karên xwe nebûn. Piştê bi wê sozê ku nabe serxweşiyê danên, bi telefon yan jî name malbatên goriyan haydar kirin ku werin wesyetnameyên îdamkiriyan bibin. Diyare wesyetname bi tewayî hatibûn kundirolkirin ku tu zanyariyek li ser wan îdaman negîjin derve. Piraniya îdamkiriyan bi awayê bikom li goristana Xaweran hatin veşartin û heya niha jî cihê veşartin û çalkirina piraniya wan nexûyaye. Zaf kes dibêjin cenazeyên hin ji wan şewitandine. Niha take cihê ku malbatên goriyên destê cinayeta Komara Îslamî di sala 1367 a Rojî de berê xwe didinê, goristana Xaweran e ku ji bo serê çend salan e kes û karên wan goriyan ji bo bîranîna wan li wir kom dibin û bêguman bûye cihê nîgeranî û lerzîna stûnên kela zulm û zordariya Komara Îslamî.

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdulla Hicab



Qasimlo Ê Pêşmerge

2 1 sal bi ser şehîdbûna Dr. Abdulrehman Qasimlo re derbas bûn. Di wan 21 salan de gelek bas

û şirove li ser kesayeti û rola Dr. Qasimlo di tevgera Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û nûjenkirina PDKÎ hatine gotin. Basa Qasimlo ê diplomat tê kirin, Qasimlo ê rewşenbîr, Qasimlo ê abûrînas, Qasimlo ê siyasetsvan û hwd. Dema ji bo 21 saliya şehîdbûna Qasimlo ji min daxwaz hate kirin ku li welatê Austriya (Utrîş) basekê pêşkêş bikim, cemedaniya serê Dr. Qasimlo û cilên wî yên pêşmergegatiyê ji her tiştî pitir bala min kişand. Qasimlo ê PÊŞMERGE xwediyê gelek taybetmendiyên bû ku heya niha hin ji wan di munasibetên cuda de hatine baskirin. Qasimlo ê pêşmerge bi huner, edebiyat, abûrî, siyasets, rewşenbîrî û diplomasiya xwe PÊŞMERGEYEK Kurdistanê bû. Eger mirov bixwaze taybetmendiyên wî pêşmergeyê pêşeng, ji "P" ya destpêkê re heya "E" ya dawî bi kinî bas bike, Qasimlo ê PÊŞMERGE xwediyê pênaseyek weha ye:

Pêşeng

Dr. Qasimlo pêşengê têkoşîna azadîxwaziya gelê Kurd li Rojhilata Kurdistanê bû. Ev ne bi tenê weke serokê partiyek siyasî, lê weke mamostayekê hertim ji hevkar û hevberên xwe re sembola xwe nû kirin, guhertin, pêşveçûn û nûjeniyê bû. Qasimlo ê pêşeng ji bo avakirina kultûra demokratîk kedek mezin da. Di demekê de ku Rojhilata Kurdistanê ji bo guhdarîkirin ji takek pêşeng amade bû, Qasimlo basî kultûra xwe bi rêxistinîkirin û demokrasiyê da pêş heya ku kultûra takperestiya li Rojhilata Kurdistanê bi cih nebe. Di bin mercên dijwar de ev kultûr bi lêger û astangan re rû bi rû bû, lê keda Qasimlo encam jî dan û bingeha kultûrek cuda ya ku rê ji bo demokrasiyê vedike ava kir. Rola pêşengbûna Dr. Qasimlo ji kultûra siyasî bi der, warên civakî û kultûrî jî bi xwe ve digirt. Di hemû salên dijahwe têkoşîna azadiyê û di bin mercên zehmete şer de, Dr. Qasimlo rê neda ku jiyana asayî ji têkoşîna partiya ku wî serokatiya wê dikir bi dûr bikeve. Qasimlo hemû rengên jiyane dihebandin û pêşxistina siyasetsê ji pêşketina civakê cuda nedikir. Lewma ji bo avakirina kultûrek li ser wê bingehê hertim di rêza pêşin ya têkoşînê de bû.

Êş u azara gel

Ji Qazî Muhemedê mezin re heya Qasimlo û Şerefkendî ê nemir, rêberên PDKÎ di jiyana û mirinê de hertim bi gelên xwe re bûne. Weke çawan Qasimlo xweşiyên gelê xwe parve dikir, di heman demê de jî ew di rêza

pêşin ya wan kesayetiyan de bû ku amade bûn ji bo xweşiya jiyana gel, bi xwe tama êş u azarê ji nêz ve hest pêbikin. Weke gelê xwe ev jî rastî koçberî u jiyana bi dijarî hat. Li çyan, di bin xêwetan de jiya. Kete bin barana bombe û topên neyaran. Ji nêz ve şer dît u di dawiyê de jî weke hemû şehîdên gelê xwe rastî tîra dijminê xwe hat. Laşê bi xwinê xemiliye Qasimlo û hevalên wî nişaneyê herî xurt bû ku derdixist çawan û heya ku Qasimlo di nava êş û azarên gelê xwe de dijî.

Sorişgeriya

Şorişgeriya Dr. Qasimlo bi tenê di wê yekê de nebû ku wî ji bo guhertina sistema deselatdar û avakirina sistemê nû kar dikir. Wî guhertin ji xwe û ji partiya xwe re da destpêkirin. Ji bo ku bingeha guhertinan amade bike, Dr. Qasimlo hevberên xwe jî fêrî guhertinê dikirin. Weke mamostayekê ku hertim şagirtên xwe fêrî tiştên nû dike, Qasimlo hewl dida ku hevberên xwe bielmîne kultûrek alternatîv ku rê ji bo guhertinên bingehîn di civakê de xweş bike. Wî şoreş weke pêvajoya avakirina kultûrek alternatîv temaşê dikir

Mîmar

Rola Dr. Qasimlo di ji nû ve avakirina PDKÎ de xuya ye. Weke çawan di pêvajoya guhertina qewareya qewmî re ji bo nasnameya nû ya neteweyî, kesayetiyan pêşeng weke mîmar û endazyarên avakirina qewareya nû rol dilîzin, Qasimlo jî karî hesta qewmî li Rojhilata Kurdistanê di çarçoveya PDKÎ de nûjen bike, bixwe kanalek nû û tevgerê nû ya neteweyî bîne meydana. Dîrok her demê kesayetiyan derdixist meydana ku pêşengiya bizav û tevgerên nû bikin. Kesayetiyan ku dîrok wan derdixist holê dikarin şopek mezin li ser pêvajoyên siyasî danên. Lê kesayetiyan ku bi xwe dîrokê çê bikin tak in. Qasimlo yek ji wan kesayetiyan bû ku karî dîrokek nû ava bike û têkoşîna neteweyî li Rojhilatê Kurdistanê bi awayek modern bivejîne û bixwe ser hêla siyasetsê hemdem.

Evdandarê jiyane

Kêm kes weke Qasimlo hezkiriyê xweşiyên jiyane bûn. Di gel ku wî hemû xweşiyên jiyana xwe kiribûn goriyê armanca siyasî, û jiyana xwe bi yekcarî xistibû xizmeta neteweya xwe, lê wî tu car xemlên jiyane jî bîr nekirin. Ji pak û xawênîya tak û jîgehê re bigre heya xurtkirina kultûra jiyaneziyê. Kesên ku Qasimlo ji nêz ve nas dikirin an bi wî re kar dikirin hertim ken, dilxweşî, jiyaneziyê u pîtedan bi hemû war û rengên jiyane li cem wî diditîn.

Her gulek bêhnek û her rengê xemlek bû ku tu gav ji ber çavên Qasimlo wenda nedibûn. Lewma jiyana şorişgerî û têkoşîna siyasî ji wî re rêgir nebûn ku di gel karê siyasî, bi kultûr, edebiyat, şêr û dab û edetên civak û gelê xwe re jî mijûl bibe.

Rênişander

Pîvanên ku Dr. Qasimlo di siyasetsa PDKÎ de bi cih kirin, îro, 21 sal piştî şehîdbûna wî, weke çavsa x û rênişanderê rêçika siyasî li Rojhilatê Kurdistanê di rojê gel de ne. Qasimlo ji kultûra nefretê bi dûr bû. Lewma her derfetek ku biketa dest, bi kar dianî heya deriyekê di riya siyasî de veke. Her çend ew hewlêdan bû hegerê şehîdbûna wî, lê wî pîvana "di siyasetsê de dostê heya dawî an dijminê heya dawî nîne" bi cih kir. Qasimlo her weha hewl dida ku di navbera dijberiyên de û di rewşên aloz de heya li destan tê parsang an balansê biparêze.

Di gel ku wî hewl dida ku kurdên her beşek Kurdistanê bi doza xwe li çarçoveya welatê ku lê dijîn re mijûl bin, lê Qasimlo tu gav xebata hevbeşe neteweyî ji bîr nekir. Ew weke şevirmendekê hertim bi tevgerên Kurd li beşên din yên Kurdistanê re di têkiliyan de bû û her gav ku pêwîst didit bi şevr û şîretên xwe doza neteweyî di beşên dine Kurdistanê de bi pêş dixist. Qasimlo di heman demê de hertim bi rewşenbîr û pêşengên Kurd li beşên dine Kurdistanê re di têkiliyan de bû û ji bo avakirina kultûra hevbeş ya neteweyî rê nişanî wan dida. Mînaka herî diyar ji karê Dr. Qasimlo bo piştgirîkirin ji karê hevbeşe neteweyî re alîkariya wî ji bo avakirina Enistîtûya Kurd li Parisê di sala 1983 de bû ku bi hîmdariya serokê niha yê Inistîtûyê Kendal Nezan, Qanatê Kurdo, Cigerxwîn, Mam Celal û hwd ava bû.

Gelaledarê

Dr. Qasimlo kesayetiyekek dûrbîn bû ku hem ji bo dema tede dijiya û hem ji pêşerojê re xwediyê pîlanên demkurt û demdirêj yê siyasî bû. Eger hin ji pîlanên Dr. Qasimlo di piratîkê de pêk nehatibin jî, lê wî tu gav bê pîlan dest bi karekî nedikir. Lewma di dema jiyana Dr. Qasimlo de mijara sereke di nav rêxistinên PDKÎ de her tim pîlanên kar ji bo pêşxistina tevgerê bû.

Efsane

Qasimlo jiyana xwe kire goriyê azadiya gelê xwe, lê piştî şehîdbûnê bû ustûreyek neteweyî ku ji bo pêşeroja gelê xwe rastî û efsaneyê bi hev re girê dan û ji bo nivşên pêşerojê bû efsaneyek ku hertim wê di hizr û xeyala keç û xortên welat de zindî bimîne.

Sirušta bedev a Kurdistanê li nav peşqelên agir de ruh dide



Selîm Zencîrî
rondik24@yahoo.com

Komara Îslamî ya Îranê li midehê sê dehsalên desthilatdariya xwe de ji hemû mafên demokratîk û berheq yê gelê kurd xwe parastîye û serbarê

bêmafkirin û bêparakirîne, siyaseta çirmisandin û helandina gelê kurdistanê bi awayên cur bi cur girtiye ber xwe. Lê li vê navberê de serbarê wan tepeserî û hovêtiyan, dujminahiya rejîmê li gel xweza û sirušta Kurdistanê jî bêhempa ye û heya niha bêrehmane sirušt û daristanên Kurdistanê bi hêcêten cur bi cur kirine goriyê agirê kerb û kîn, xezeb, siyaseta û serhişkiyên xwe.

Siruşteke ku rengîniyek taybetî daye jiyane û xemlek dilrevîn û bedev daye xwezaya kurdistanê û bandorek pir mezin jî di rakîsandina torîst û gerokan bo kurdistanê çêkiriye û bûye bi çavkaniyek baş ya dahatê bo xelkê vê deverê. Siruşteke dewlemend bi çavkaniyên binerd ve ku bûye beşek ji dahatê, lê ne ji bo jiyana guzerana xelkê Kurdistanê, belkî ew dewlemendî bûye sebêbê balkişana zêdetir a talançî û tîmehkarên rejîma Îranê. Lewma bi salan e ku rayedarên rejîmê vê samana kurdistanê talan dikin û niha jî çavê wan beredayî nade û pîlanek pir metisîdantir ji talanê bo têkdana sirušta kurdistanê dayne destpê kirin ku ew jî agir berdana daristan û çêrîngehên Kurdistanê ye.

Eva çend sal in ku Komara dijî mirovî û dijî sirušta a Îslamî a Îranê li demsalên Havînê de bi girtinepêş a siyaseta erdê şewitî li Kurdistanê de dest dawêje şewitandina daristan û sirušta kurdistanê û li midehek kêm de çendîni donim jî daristanên Kurdistanê kirine xwelî û bûne bi destek rût û kirêt. Ew sirušta ku emanet û mîratê nîfşên pêşerojê ye, îsal jî ketiye ber xezeba rejîma dijî mirovî û dijî jîngehî a Komara Îslamî û niha piştî borîna çend heftiyên bi ser vê tirajidiyê xembar de, her roj agir berfireh xurttir dibe û xisarên

qerebûnekirî ji sirušta û samana Kurdistanê dide û hêj tu hewl û kiriyarek ji bo kuntirrol û temirandina vê nehatiye encamdayîn û li vê derheqê de berpirsiyarên rejîmê û yek ji wan jî birêveberê çavkaniyên siruşti yê Parêzgeha Kurdistanê bi bêşermiyek tewaw ve wan agirên dixê stûyê xemsariya şaromendan, germiya seqa û pûşê zaf!!!

Eve jî li halekê de ye ku li gor esla 50 ya Yasaya Bingehîn a rejîmê li rewş û zirûfek wiha de divêt hemû nawend û organên leşkirî û jîngehî yê rejîmê bona pêşgirtin ji xesar û zirarên zêdetir bikewin liv û xebatê. Lê em dibînin ku ne tenê hewlê ji bo temirandin û kuntirrola wê nadin, belkî bi xwe pilandarêjî û sebêbkarê sereke ne, lê ji hêla din ve jî amadegiya xwe ji bo vemirandin û hevkarî kirin bona kuntirrol kirina agirê daristanên Rûsiyayê nîşan daye!! Lewma ev gotina pêşiyên vir de li gor vê helwesta rejîmê bi cî ye em bînin ku "Ma gelo çirayek ku ji bo malê hewce be, mizgeftê re ne heram e"?

Para herî zaf ya wan agirên ji ber manorên leşkirî, terhen ewlehî yan êrîşên rejîmê bo ser sînorên Herêma Kurdistanê û topbaranên wan bi hêceta hebûna hêzên



çekdar yê dijber û neyarên rejîmê li deverê de tîncamdayîn, beşek din jî bo têkdana berqesd a sirušta Kurdistanê. Li wan cihên din de jî ku hêj çavkaniya agir yan sedemên wê rohn û eşkere ninin, li gor gotina xelkê deverê dezgehên agir temirandinê û parastina jîngehê yê rejîmê ne tenê tu hewl û xebatekê ji bo temirandina agir nadin, ji ber ku bi afirandina asteng û girêpêçkan ji bo xelkê û NGO'ên aligirê Parastina Jîngehê, hewil



dane bi hinceta meseleyên ewlehî pêşiya karê xwebexşane û fidakarî û dilsojiyên xelkê bigrin û rê nedin wan ku agir bitemirînin. Herweha nemaze rê bi nûçegihan û wênegirên nûçegihaniyan jî nadin ku nizikî wan deveran bibin daku dengvedan li ragihandinan de nebe û li bêdengiyek tewaw û xembar de daristanên kurdistanê li nav peşqel û guriyên agir de ruhê xwe bidin.

Bi vê çendê jî eyan e ku sedema wan agirên, siyaseta, pîlan û biryarên berpirsiyarên payebilind yê rejîma Komara Îslamî li kurdistanê de ye ku dujminkarane û hovane ketine canê sirušta kurdistanê û dixwazin bi têkdana vê xwezaya bedev, vê samana dewlemend ji kurdistanê bistînin û deverê jî bi vê çendê tevlihev û ewlehî nîşan bidin.

Li gor vê yekê jî karnasên jîngehê li ser vê baweriyê ne ku ger jinavbirina daristanan li Îranê de bi vê pêvajoya niha dom bike, heya çend salên din em dê bibine şahidê jinavçûna yekcarî ya daristanan li Îranê de, her çend ku renge li hin deverên din yê Îranê de sedemên din yê însanî û siruşti bibine sebêbê şewitîna daristanan, lê bilîberçav girtina wan siyaseta, îdeolojî, derbasbûyî û kiryarên rejîmê li kurdistanê de tu şik û gumanek ji desthebûna rejîmê li vê kompîloya mezin de nîne. Lewma li vê rewş û zirûfê de erkê hemû takên neteweya kurd, çalakên warê parastina jîngehê û mafên mirov li Îran û cîhanê de ye ku bi yekxistina deng û hewl û xebatên xwe dijî vê siyaseta şaş û dujminkarane yê Komara Îslamî, pêşiya domandin û berdewamiya siyasetek bi vî awayî bigrin û rê nedin ku sirušta Kurdistanê zêdetir bibe goriyê siyaseta serkut, têkderî û dagîrkariya Komara Îslamî.

Hawirdeya Benzîne bo Îranê ji Sedî 50'î daketiye

Di rapora amadekirî a ji aliyê kompaniyaya "Energy Market Consult"ê ve tê gotin di meha tîrmeha îsal de, asta hawirdeya(import) benzîne bo Îranê ji sedî 50îkê bûye û gihîştîye 60 hezar bermîlan di rojê de.

"Wicay Mokricî" ravayr û amadekarê vê raporê ragihand ku di meha pênc a zayînî de Benzîna hawirde bo Îranê 120 hezar bermîl di rojê de bû. berê dihat pêşbînîkirin ku rêjeya hawirdeya benzîne bo Îranê 65 heya 70 hezar bermîl di rojê de be.

Jêrdehatina han piştî pesendkirina durpêçên nû pêk hat. Çimku welatên weke Rûsiya,

Emarata Yekbûyî ên Erebbî, şandina benzîne bo Îranê sekinandin. Niha benzîna Îranê zêdetir ji aliyê şirketên Turki û Çini ve tê dabînkirin.

Divê vê yekê jî bibêjin ku kompaniyaya dewletî a Malizî a bi navê "Petronas"ê, şandina benzîne bo Îranê sekinand. Şirketa Rûsî a bi navê "Luko Oil"ê jî ragihandibû ku dê xwe ji dana benzîne li derveyî çarçoveya durpêçan, bo Îranê biparêze. Berê jî kompaniyaya niştî a "Royal Dutch Shell"ê jî firotina benzîne bo Îranê sekinandibû. Vê şirketê jî ji tîrsa durpêçên Amerîkayê li dijî Îranê şandina benzîne bo Îranê sekinandibû. Kompaniyayên weke Vitol a Siwisê, Trafigura

Holandayê, British Petroleum a Berîtanîyayê, kompaniyaya Berîtanî - Danmarkî a bi navê Shell hatine nava refa şirketên "Reliance Industries", "Glencore" û "Ingersoll Rand"ê, ku firotina benzîne bo Îranê sekinandibûn.

Di sala 2009'an de beşek zêde ji benzîna Îranê ji aliyê Emaratê ve ku pitir ji %70 bû, dabîn dibû. Mezintîrîn dabînkêrên benzîna Îranê di sala borî de Emarat, Hind û Turkemîstan bûn. Pêka serhejmarîyan di sala borî de %72 benzîna Îranê ji aliyê Emaratê ve dabîn dibû ku nirxa wê zêdeyî 3 milyar dolaran bû. Herwiha %9/49 benzîna Îranê ji aliyê welatê Hindê û %4/23 jî ji aliyê Turkemîstanê dabîn dibû.

Komara Îslamî li dewsa rejîma Sedam de diherike

Amadekar: Arîn

Pîştgirêdan bi rêçareyên şetane ji aliyê pawanxwaz û xwexwazan ve li demên şikest yan binbestên metrsîdar de, şewazên cur bi cur hene. Hin ji wan dest didin xwekujiyê û hin jî welat bi xwe re ber bi serhişewiya nemanê ve dibin. Li dîroka hevdem de Hîtler ji desteya yekem û rejîma Sedam Husên jî li desteya duyem de bû.

Rejîma Komara Îslamî vê dawiyê, xwe bi rewşekê re ber bi rû dibîne ku rejîma Beis ji ber serhişkiyên xwe bi civaka cîhanî re pêre tûş bû û rîya berbirû bûnê her wekî Sedam Husên girtiye ber xwe. Siyasetek ku nemaze nîzik û hevbirên rejîmê jî ji encamên wê bi rîjdi nigeran in û dijberî û hevrikiyên hundirîn yên wan, eyankerê vê yekê ye.

kiryarên hevşêwe û beramber, çawa?

Rast li vê demê de Wezîrên Derve yên 27 welatên Yekêtiya Ewropayê, tehrîmên yekalî li dijî Îranê pesend û fermî kirin. Li gor wan tehrîman, YE'ê tevî Amerîkayê, cezayên girantir ji biryarnameya 1929 a Şewra Ewlekar bi armanca îzoletîrkirina rejîma Îranê ji hêla siyasî û aborî ve xistin warê piratîk ve.

Biryarnameya Şewra Ewlekar ji bo razîkirina Rûsiya û Çînê, warê neft û gazê bi xwe ve negirtibû, lê Amerîka, YE û çend welatên din weke Kanada, Japon û Austoralayê biryar girtin ku bi pesendkirin û birêvebirina yasayên cuda, vê beşê jî bixin bin tehrîman.

Ev tehrîm berî wê ku bi fermî bikewin warê piratîk ve, bandora xwe kirine.

Her terze dij "kiryarên beramber" ji aliyê rejîma Îranê li hember sepandina wan tehrîman ve, pevçûn û berbirû bûna rasterast bi Amerîka û Ewropayê li pey xwe re tîne. Heya cihekê ku bi lêgerîna gemî û barên biguman pêwendî hebe, çunku li gor biryarnameya pesendkirî ya Şewra Ewlekar, ger Komara Îslamî dest bawêje kiryarek hevşêwe yan berxwedana leşkirî, dê xwe hemberî rêxistina NY û civaka cîhanî de bibîne û eva jî heman rê ye ku Sedam Husên hilbijart.

Ji ber dorpeçên navnetewî li dijî Îranê, şirketên navnetewî yên Bîmê, piştewaniya ji hêlên gemîvaniya Komara Îslamî sekinandine, lewma şîyan û karîna Îranê ji bo veguhastina gelek ji alavên girîng bi rîjdi kêmbûyê û ger vê piştewaniya bîmê bidest nexin, tu bender û lengergehê li cîhanê de wan wernagire. Lewma jî nebûna gemî û hevkarî nekirina gelek ji şirketên Bîmê û veguhastinê, warê hawirde kirinê dê tûşî astengiyên bibe û li aboriya yekpar a cîhanî de reviyân ji dest dorpeçan karek pir zehmet e. Bi giştî Amerîkayê ji bo bank, kompaniyên neftî û aborî yên cîhanî peyamek rohn û eşkere heye ku gelo hûn

dixwazin bi Amerîkayê re ticaretê bikin yan bi Komara Îslamî ya Îranê re?

Terhê êrîşa leşkirî amade ye

Tevî pêşdeçûna demê û sepandina 4 gerên tehrîman ji aliyê civaka cîhanî ve li dijî Îranê, rejîma Komara Îslamî jî her li ser bernameyên navikî yên xwe berdewam e û pêşketinê berçav jî bidest xistine û pitir ji armancên xwe jî nêzik dibe, lewma nigeraniyên navnetewî jî zêdetir bûne û carek din rêçareya leşkirî li dijî rejîma Îranê li dor sekinandina bernameyên navikî yên wî welatî bûye rojev. Wekî diyar e Amerîka pitir ji her demek din gihîştîye vê bawerê ku ji bo pêşgirtin ji etomîbûna Îranê divêt ji êrîşa leşkirî mifahê bistînin.

Mayk Molên, Serokê Sitada hevpar ya arteşa Amerîkayê li got û bêjek bi NBC TV'ê re ragihand ku terhê êrîşa leşkirî li dijî Îranê amade ye. Wî di heman demê de nigeraniya xwe ji encamên vê rêçareyê da eyanê û got ku êrîşa leşkirî dikare encamên nexwastî li pey xwe re bîne, lê her du jî me



nerihet dikin, him Komara Îslamiya teyar bi çeka navikî û him jî êrîşa leşkirî. Lê neveşart ku rêçareya leşkirî li destûra kar de heya.

Berî wî jî Maykil Haydin, Serokê berê yê SIA'ê ragihandibû ku bi bêencam mana hemû hewlên Waşingtonê, êrîşa leşkirî îmkana vê heye çunku em got û bêjan dikin, ew her li ser bernameyên xwe berdewam in, tehrîman dixin ser wan, ew her berdewam in. Hewlan ji bo pêşgirtina wan didin, ew her berdewam in, lewma bi berdewamiya vê rewşê wusa dixuye ku êrîş hetmîtir bûye.

Eve jî li halekê de ye ku liv û bizavên Amerîka li deverê de zêde bûne û nawend û paygahên xwe li Asyaya Navîn de ji bo êrîşê amade kiriye û çendîn gemî(Navgan)ên şer yên hilgirê balafiran li Xelîca Farsê de cihgirî kiriye û herweha rayedarek leşkirî yê hikûmeta Îraqê jî ragihandiye ku Amerîkiyan li du mehên derbasbûyî de 7 hezar komandoyên xwe tevî radarên pêşketî û alavên leşkirî yên giran li nîzik her sê xalên sinûrî li gel Îranê (Mendelî, Emare û Pênciwînê) cihgirî kirine ku her yek ji wan îşareyek in bi xweketin û xwe berhevkirina Amerîkayê ji bo êrîşê.

Piştewaniya endamên Kongireya Amerîka ji êrîşa leşkirî ya Îsrailê li dijî

Îranê

Ji hêla din ve jî heftaya derbasbûyî bi dehan endamên Kongireyê reşnivîsa biryarnameyê wajo kirin ku têde piştewanî ji êrîşa leşkirî ya Îsrailê li dijî Îranê li egera domandina bernameyên navikî yên wê kirin. Ew piranî Komarîxwaz bûn û ji mafê Îsrailê bo berevanîkirin ji desthilat û tenahî û parastina canê şaromendên xwe bi mifahstandin ji her alavek hewce bo pêşgirtin ji gefên etomî yên Îranê, berevanî kirin.

Dijkiryara Îranê bi wan gefan

Hevdem li gel wan gefan û bi taybet piştî pesendkirina gera 4'mîn ya dorpeçan li dijî Îranê rayedarên siyasî û leşkirî yên Komara Îslamî jî amadebûna xwe bo ber bi rûbûn li hember her gef û êrîşekê de ragihandin. Ehmed Cenetî li nimêja Înê ya heftaya derbasbûyî de ragihand welatên ku bixwazin balafir û gemiyên me bipişkivînin, yan şevatê nedîn balafirên me, dê bi kiryar û helwesta beramber ya me ber bi rû bibin. Çend rojan pêştir jî meclisê terhek pesind kir ku li gor wê dewlet neçar dibe derheq wan welatan kiryarên hevşêwe encam bide.

Ji aliyê din ve jî Ehmedînijad çend rojan berî niha bas ji terhê êrîşa leşkirî ya Amerîkayê bo çend welatên deverê kir û got: "Amerîka li hizra birêvebrina senaryoyekê li dijî Îranê ye. Ew dixwazin êrîşî çend welatên deverê bikin û paşan jî bera êrîşên xwe bidin me, lê ew senaryoya wan ya nepenî niha li ber destê me de ye û paşan hişyarî da û got: Her welatek bi vê senaryoyê re hevkarî û hevrêtiyê bike, Îran vê kiryarê bi dujminatî dihesibîne û bi tundî dê bersiva wan bide".

Herweha Serdar Yedula Cewanî, Cihgirê siyasî yê Sipaha pasdaran jî ragihand ku "ger Amerîka biçûktirîn şaşî yan bi xirab bilive, emê deverê tevîhev bikin û herwekî me berê jî gotiye ewlehiya Xelîca farsê yan bo hemûyan, yan jî bo tu kesê". Mehdi Xezai, Balyozê Îranê li NY de got: Li egera gihandina kêmtirîn zirara Îsrailê bi Îranê, emê hemû eniya şer û Tilavîvê bikişînin nava agir û text bikin û ...hwd.

Her çiqas ku êrîşa leşkirî li dijî Îranê jî zirar û encamên nîgatîv yên xwe hene û tu kes yan aliyek xwazyarê vê yekê ninin, lê serhişkî û serberedayîtiyên rejîmê vê egerê bihêz dike ku welatê me Îran tûşî alozî û rojreşiyek wiha mezin bibe, lê kar û zehat û bizavên rejîmê li arasteyek metirsîdar de dimeşe û renga bi zûyî ew terh bikewe warê piratîk ve û rejîma, xelkê Îranê bike mertala serhişkiyên xwe. Lê ya eyan û eşkere ev e ku rejîm jî li dewsa rejîma Sedam de dimeşe û ev siyaseta, axaftin û gef, bîranîna siyaseta Sedam Husên û gef û gurên berdevkê dewleta wî, Seîd Sehaf li ser û bendê êrîşa leşkirî bi Îraqê de tinin bîra mirov ku bi wan gef û serhişkiyan ve serê xwe û rejîma xwe çawan rezilane xwar.

Kuştina şaromendên kurd bi çi mebestekê?



Mecîd Cinîkanlo

Rewşa aboriya
Kurdistanê û
berbirûbûna Komara
Îslamiya Îranê bi
herêmên Kurd akincî
re, hertim yek ji

pirsgirêkên desthilatdarên rejîma Îranê bûye, û hertim bersiva Komara Îslamî bi herêmên Kurd akincî, kuştin û tepeskerkirina Kurdan li vê herêmê de bûye. Rojhilatê Kurdistanê herêmekî pan û berfireh e ku li bajarê Makuyê ji sînorê Komara Azerbaycanê re dest pê dibe û heya bajarê Abadana li parêzgeha Îlamê dirêjî heye. Bi giştî Kurdistanê Rojhilat, ji çar parêzgehên Azerbaycana Rojava Kurdistan, Kirmanşan û Îlamê pêk tê. Ev xaka pişkek mezî ji xaka giştî ya welatê Îranê pêk tîne.

Nifûsa Kurdan li Îranê, nêzî çarde milyonan kesan dibe ku nêzîk bi 2 milyon ji wan, li parêzgehên Xurasan, Gilan, Qezwîn û Azerbaycana rojhilat de dijîn.

Nifûsa Kurdan li Kurdistanê nêzî 12 milyon kesan dibe, ku 17% ji nifûsa giştî ya xelkê Îranê pêk tîne.

Di warê rewşa aborî û çavkaniyên bin erdî, Kurdistan yek ji mezintirîn çavkaniyên aborî yê Îranê ye. Hebûna sînorê hevpar tevî Komara Azerbaycan, Turkiye û başurê Kurdistanê, rojhilatê Kurdistanê yek ji herêmên sîtratejîk li Îranê û navçeya Rojhilata Navîn e. Kurdistanê Rojhilat seba sînorê hevpar tevî Turkiyê, wek derwazeya welatê Îranê bo welatên Ewropî tê hesabandin ku salane bi dehan hizar kes, li rêya vî sînorî ve serdana Îranê dikin û ew yek qazancekî mezî ji bo aboriya Îranê heye.

Ji aliyekî din ve çavkaniyên jêr erdî wek gaz, petrol, zêr, mîs û asîn dewlemend û zengîniyek pir mezî danewê deverê.

Zana û pispor dibêjin ku eger Komara Îslamî li ser gaza parêzgeha Îlamê sermayê danê, ev parêzgeha yek ji çavkaniyên herî mezî yê gaz cihanê dikare dabîn bike ku bi alkariya nefta Kirmanşanê dikare rewşa aboriya Kurdistanê bi yekcarî biguhere.

Li parêzgeha Sinê mezintirîn kana zêrê cihanê li wir e ku salane bi dehan hizar milyon qazanc ji bo aboriya Îranê heye.

Parêzgeha urmiyê wek yek ji herêmên herî sîtratejîk yê Îran û Kurdistanê tê hesabandin ku bi hebûna sînorên hevpar, siruştê bedev û gola Urmiyê, bandorekî mezî li ser aboriya Îranê heye.

Lê sed heft û mixabin serbarê wan hemû zengîniyên welatê Kurdan, Kurd hertim li hejariyê de dijîn, û çar parêzgehên Kurdistanê li hejartirîn parêzgehên Îranê ne.

Li wan çar parêzgehan de ku bi Kurdistanê hatine nasikirin, tu karxaneyekî weha tune, û rejîm jî dewlemend û zengînen Kurd ku dikarin li wan herêman sermayê danên, neçar dibe ku li bajarên dinê yê Îranê û bi taybetî bajarên Fars

akincî, sermayeya xwe li wir danên. Bi awayekî ku Kurdistan wek herêmekî herî paremayî li nav welatêkî paremayî de maye û ev rewş roj bi rojê xirabtir dibe.

Rewşa han bûye sebeb ku li wan herêman fehşa, îdz, madeyên bêhişker û bi dehan pirsgirêkên din yê civakî li nava civaka xelkê Kurdistanê bihêne pêş. Pêka serjimêriya malpera ÎRNA, parêzgehên Urmiyê û Îlam di warê xwekuştinê de pileya herî zêde li Îranê de hene. Bêkarî wek yek ji pirsgirêkên herî serekî yê xelkê Kurd tê hesabandin.

Nihêrîna ewlehiya Komara Îslamî bo wan herêman û bi taybetî ji bo nivîsa xwandewar û tawanbarkirina ciwanên Kurd bi cudaxîwaziyê, hemû bi hev re bûne sebeb ku Kurd, Îranê bi welatê xwe nezanin û parek ji wan ciwanan bi hêviya jiyaneke baştir û dirêjîdana bi xwandinê û peydakirina karekî, ber bi welatên Ewropî ve biçin.

Parek din ji wan ciwanên Kurd ku derfeta xwandin û çûna bo Ewropayê ninin, bi neçarî ji bo têrkirina zikê xwe yê hertim



birçî li sînorê rojhilatê Kurdistanê kolberiyê dikin, ku rejîma Îranê navê vî karî daniye "qaçax"?

Ya rast ev e ku pêka hemû zagonên navnetewî dewlet li hemberî dahat û bijîva jiyana şaromendên xwe de berpirsyar e û divê desthilatdarên her welatekê ji bo xelkê welatê kar û jiyana wan dabîn bikin. Lê li welatê Îranê dewlet xwe li hemberî xelkê xwe de berpirsyar nizane û çî hevkarîyê ji bo baştirkirina jiyana xelkê nake û bigre dahata xelkê welatê ji bo grupên tundajo yê terorîst dişîne û bi vî awayî xelkê welatê li hemû mafên xwe yê mirovî bêpar dibe. Li rewşê û zirufekî weha de xelk bi neçarî li sînoran kasibiyekî dikin ku tenê zikê xwe têr dikin. Li wan sînoran dewletên dagirker û bi taybet Komara Îslamiya Îranê bi hezaran mayn çandine ku salane canê denan xortên Kurd digire û gelek ji wan jî parek ji leşê xwe ji dest didin.

Serdar Mehmûdî, fermandeyê hêzên sînorî yê Komara Îslamî li civîna polis û vîlehiya welatê da got: Egr çî hebûna qaçaxa alavan li sînoran ji ber piştevaniya

qaçaxçiyên li grupên dijî şoreşê ye, lê li pişkek ji axavtina xwe de got: rewşa coxrafiya herêmê û nebûna aboriyekî baş li navçeyên sînorî, mezintirîn sebebê vî karî ji aliyê xelkê ser sînoran e!

Wî herweha got ku li dirêjahiya 50'î kîlometriya sînor, yek karxane nîne û seba vê rewşa xirab rewşa aboriya xelkê li sînoran zaf xirab e?!.

Pêka amarên bilavkirî ji aliyê Ebdulriza Mehmûdî li dirêjiya sala 1388'an li sînoran 336 kes hatine kuştin û 700 kesên din hatine birîndarkirin.

Mehmûdî her wisa got ku li sînorê Îran û Îraqê tu binkeyên leşkerî ên sînorî ninin û ji ber vê yekê qaçaxa vî sînorî ji rêya hêzên Îranî ve tê kirin?

Li vir de pirsê ewe e ku hekî xelk ji bo yarmetîkirina bi grupên bi qîseyê Mehmûdî dijî şoreşê re qaçaxê dikin, gelo hêzên Komara Îslamî çima û ji bo çî qaçaxê dikin? Gelo ev yeke vî hîndê nade xuyakirin ku hêzên Komara Îslamî bixwe wek xelkê hewceyî vî karî ne?

Lê çima Mehmûdî tu carî îşare bi wan jin û zarokên Kurd nake ku li ser sînoran ji bo 2 hezar tumanî canê xwe (bi dest hêzên ku dibe parêzerê jiyana xelkê bin) ji dest didin û heta kes nabêje ev ji bo çî û bi çî tawanekê hatine kuştin jî?

Gelo karê hêzên Komara Îslamî parastina canê xelkê ser sînoran e, yan kuştina wî xelkî?

Rapora saziya mafê mirov li Îranê vî yekê dide nîşandan ku ji ber nebûna kar û dahatê li nav xelkê Kurd, parek ji vî xelkî li sînoran alavan li Îraqê ji bo Îranê tînin ku piraniya wan jin û zarok in, û ev kare tenê ji bo peyda kirina pariyek nan ji bo malê ye.

Di warê tawan nasîyê ve, ev tomet û boxtana ku li wan kesan tê kirin, qaçaxa alavan e?

Lê li ber nebûna tu derfetekî karî ji bo vî xelkî, ew tawan bi çî awayekî tawan nahê hesabandin, çimku ev kar tenê ji bo peydakirina bijîva jiyana wan e û dewlet li vî tawanê wek tawanbarê sereke tê hesabandin ku nikare jiyana vî xelkî dabîn bike.

Li rewşekî wisa de, ku divê dewlet parêzerê jiyana xelkê be, mixabin Komara Îslamî li ber dijayetiya xwe ya bi salan, tevî xelkê Kurd bi behaneyên curbicur xelkê dike û bi tu awayekî guh nade gazîdeyan.

Roja çarê Puşpera sala 1389'ê hêzên rejîma Îranê li herêma serdestê û li gundê Dermanawa zarokêkî Kurd bi navê zaniyar Îbrahîmî kurê Mihemed kuştin?

Gelo pêka yasayên Komara Îslamî ev kuştine diçe qalibê kîjan cezayî?

Li rastî de kuştina Kurdan li sînorê Kurdistanê Îranê karesatekî mirovî ye ku rejîma Îranê pêk aniyê û rejîm li hemberî vî yekê berpirsyar e.

Turkiye di dema desthilatdariya AKP'ê de

Beşa 2



Şakir Molayî

Di yekemîn beşa gotarê de me bi kurtî bas ji çawaniya avabûna Komara Tirkîyê heya van çend salên dawiyê kir û me îşare bi vê çendê jî kir

ku komara han di bin siya yek partî de nekarî pirsgrîkên welat bi taybetî pirsgrîka herî mezin anku pirs Kurd çareser bike. Di vê beşê de em dê ji dema bideştgirtina desthilatê ji aliyê partiyek Îslamî anku Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP) heya niha şirove bikin ku vê partiyê çawa û bi çi awayekê karî li hemebr partiyên nejadperest û netewî de serbîkeve û desthilata wî welatî bi tewahî bigre destê xwe.

Yekem, partiya opozîsyon bi navê Partiya Selameta Milî bû ku ji aliyê dadgeha Yasayî a Tirkîyê ve hat daxistin, piştê endamên wê, partiyek din bi navê Refeh damezirandin û heyamê tekoşîna xwe ya siyasî bi wî navê domandin, lê piştê ew jî ji aliyê dadgehê ve hate daxistin. Piştî wê çendê û di encama hevrikiya di navbera endamên wê partiyê de, du partiyên din li ser vê bingehê hatin damezirandin Partiya Fezîlet ku endamên wê piranî xweparêz bûn û Partiya Dad û Geşepêdan jî ku endamên wê xwediyê îdeolojiyek Îslamî û Şoreşvanî bûn.

"Adalet ve Kalkınma Partisi" (Partiya Dad û Geşepêdan)ê, di sala 2001'an û piştî daxistina Partiya Refehê ji aliyê hin endamên wê partiyê, nemaze **Recep Tayip Erdogan, Abdulla Gül, İdris Nazim Şahin, Binalı Yıldırım û Bülent Arıç** ve hat avakirin. "AKP" li ser bingeha îdolojiya Îslamî ya nerimrew û netewî a şoreşvanî hate avakirin ku piraniya endamên wê yên partiya Refeh bûn. "AKP" her di destpêkê de weke opozîsyona hikûmetê kar dikir û karî di demê kurt de alîgirên xwe di pîrrianiya bajarên Tirkîyê de zêde bike û di hilbijartinan de jî serkevtinê bidest bixe.

"AKP"ê, di 2^e Cotmeha sala 2002'an de di hilbijartinan de beşdarî kir û karî ji sedî 34,63'ê dangan bi dest bixwe û bê ku di desthilatê de beşdariyê bike bû opozîsyona herî xurt ya hikûmetê. Di hilbijartinan sala 2004'an a herêmi de, ji sedî 41,67'ê dangan bi dest anî û bi vî awayî Partiya Dad û Geşepêdan karî bingeha xwe di Tirkîyê de xurt bike, û alîgirên xwe jî roj bi roj zêde bike. Her di vê navberê de wê partiyê karî bi siyasatên popolistî hejmarek zaf ji kurdên wî welatî jî di rêzên alîgirên xwe de bi cih bike.

Piştî hilbijartinê Recep Tayip Erdogan, weke Serokwezîr û Abdulla Gul weke

Wezîrê Karê Derve hatin destnîşankirin ku piştê û di sala 2007'an de di hilbijartinan de giştî de karî ji sedî 46,58'ê dangan bi dest bixin, bi vî awayî AKP bi tenê dewletê pêk bîne û di vê navberê de jî ji ber hin pirsgrîkan Erdogan li gorî yasayên Tirkîyê nekarî bibe Serokomar û Abdulla Gul wekî Serkomar hate destnîşankirin. Di hilbijartinan de "AKP"ê, cuda ji parêzgeha Dersîmê di tev parêzgehên din de karî nûneran bo Parlemanê bişîne û heya niha jî desthilata Tirkîyê bi giştî di destê wê partiyê de ye.



Xebatên Partiya Dad û Geşepêdanê:

1. Kêmkirina desthilata Artêşa di pirsên siyasî ên welat de.

2. Berbirûbûn tevî girûbûn ku dixwestin derbeya leşkerî li hikûmetê bidin (Ergenekon).

3. Vekirin û niqaşkirin li ser pirs Kurdan

Her di destpêka desthilatdariya Komarî li Tirkîyê, artêşa wî welatî xwedî bandorek taybet bû, ji ber ku tev rayedar û birêveberên welat leşkerî bûn û bawerî bi berfirekîna desthilata leşkeriyetê di welat de bûn, lewma wan bi awayekî xurt piştevaniya bihêz kirina Artêşê û hêzên ewlehiyê dikirin, ji aliyê din ve pirs hebûna çend netewan li Tirkîyê, sedemek mezin bû li ser xurtbûna artêşa di vî welatî de. Ji ber vê çendê piştî serkevtina Partiya Dad û Geşepêdanê di hilbijartinan de ku partiyek Îslamî bû, artêşa welat kete rêza dijberîkirin tevî hikûmetê û hewl da ku bandor û desthilata xwe li hemeber hikûmetê biparêze, ji hêlek din ve hikûmeta nû ku artêş li hemberî xwe didît di hewla kêmkirina desthilata wê di welat de bû, şerê han berdeham kir lê hêdî hêdî hikûmeta Erdogan karî desthilata Artêşê lawaz bike, lê mixabin serbarê vê çendê heya niha jî beşek mezin ya desthilata welat di bin kontrola artêşê de ye.

Lê sêyemîn xal û ya herî giring pirs Kurdan bû. Partiya Dad û Geşepêdan ku alîgirên wê yên Kurd jî hene, hewl da ku pirs han bike pirsê rojev û vê pirsê veke

û bi gotina wan hewla çareserkirina pirs Kurd bidin, lewma projeyek bi navê "Vebûna Demokratîk" (Pêşxistina demokratîyê yan Çareserkirina pirs Kurdan) dest pê kir. Serokwezîrê Tirkîyê di Tebaxa 2005'an de hate bajarê Diyarbekirê û di axavtina xwe de îtiraf bi vê çendê kir ku li Tirkîyê "**Pirs Kurd**" rastiyeke e û got divê ev pirs çareser bibe. Ji bo çareseriyê "Pirs Kurd" jî bal kişanda ser geşandina demokrasî û sînoren azadiyan di welat de.

Piştî axavtina Serokwezîr, li ser pirs Kurd gengeşiyêke pîr xurt dest pê kir.

Di vê qonaxê de grûbek ji siyasethan û rewşenbîrên kurd jî bona ku midaxaleyî vê pêvajoyê bikin û bihevve bona dabînkirina

mafên neteweya kurd xebatê bikin, gaziya hemû siyasethan û rewşenbîrên Kurdistanê kirin. Di bersiva vê bangê de, roja 4^e Îlona 2005'an, li Enqereyê, sedan siyasethan û rewşenbîrên kurd civîneke giştî ji raya giştî û ragihandinên cihanî re bi awayek vekirî lidaraxistin.

Di civîna 4^e Îlona 2005'an de, li bin navê "**Gelo divê Kurd bi hev re çî bikin?**" gengeşiyên mezin pêk hatin û beşdarên civînê nêrînên xwe anîne ziman. Di encama vê civînê û niqaşên beşdarên de, ji bona ku xelk û hêzên welatparêz bi hev re kar bikin, biryar hat girtin ku "**Girûpa Xebata Demokratîk û Netewiya Kurd**" (**Girûpa Xebatê**) ava bibe.

Lê serbarê baskirina pîrosêsa vekirina deriyê demokrasîyê bi rûyê Kurdan ji aliyê AKP ê ve, mixabin bi hegera zelalnebûna niyet û zêhnîyetên rayedarên dewleta Tirk, nemaze berpîrsên sereke ên ku ev pirs anîbûne holê, gel û partiyên welatparêz ên Kurd li bakûrê Kurdistanê heya niha jî bi şik û guman ve mêzeyî vê pîrosêyê dikin û herweha zêdebarê xebat û tekoşîna berdeham a dilsoj û rewşenbîr, partî û Perlemantarên Kurdan û zext û givaşên bi ser wan de, lê heya niha jî ew mijara han bêencam maye.

Lê ger rayedarên niha ên Tirk dixwazin ku pirs Kurd bi awayekî rastîn bihê çareserkin, hewce ye ku bi awayek zelal û micid helwêstên xwe bidin eyankirin û ji bo guherîna yasaya bingehîn ku sedema sereke a çaresernebûna vê pîrsê ye gavên demokratîk û hewce biavêjin.

Telaq, diyardeyek ku gefê ji civaka Îranê dixwe



Ceifer Mubeşirniya

Telaq yan jihveçudabûn, ne diyardeyek nû ye û tenê taybet bi civakek yan çend civakan nîne, belkî di pirraniya civakan

de hebûye û heye û dê hebe. Diyardeyek ku bûye sebebê pêkhatina gellek pirsên din ên civakî. Lê birastî çima îrorojê bingeha malbatê heya vê astê sist bûye? Sedem çîye dema keç û xortek ku bi hezaran awat û hêviyan jiyana hevbeş bihevve pêk tînin, lê piştî çend mehan yan çend salan ji hevdu diveqetin?

Bêşik jihveçudabûn metirsiyek mezin e li ser jiyana hevpar û bingeha malbatê têk dide. Di bersiva vê pirsê de ku sedemên telaqê çine?, mirov nikare serhildana vê diyardeyê vegevine bo yek yan du sedeman, belkî gellek faktor hene ku dest didin destê hev û dibine sebebê dev berdana hezaran jin mêran jihvedu weke:

- cudahiyên çandî
- bengdari
- xirab reftarkirin
- hevdu fehm nekirin
- nasiyarnebûn bihev re
- tundûtûjîyê
- hebûna cudahiyên hizri
- bêkarî
- nebûna xweşewîsti yê mêr de
- dexaleta derdoran
- cudahiya temen
- nexweşiyên hundurî
- pirsên cinsî
- zewaca bizorî

Lê piraniya pispor û civaknas li ser vê bawerê ne ku zêdebûna bengdarî û bêkarî di civakê de, du sedemên sereke ên jorçûnê asta telaqê ne.

Di çarçoveya rejîma Komara Îslamî de, jin weke mêran nikarin werin nava bazara kar de û ji warê aborî ve alîkar bin ji bo malbata xwe. Lewra dabînkirina bijîva jiyane dikeve stûyê mêr û mêr jî seba xirabbûna rewşa aborî a welat û nebûna delîvîyên karî û hebûna giraniyê, nikarin



bersivdrerê hewcehiyên jiyane bin. Ewa jî dibe sebebê pêkhatina zext û givaşên aborî li ser malbatê û di rewşek han de hem jin û hem mêr neçar dimînin ku jihvedu cuda bin. Kirîzek ku gişt Îran tûşî xwe kiriye û ligor çavkaniyên rejîmê bixwe niha di Îranê de zêdeyî 12 milyon kes li jêr hêla hejariyê de ne û 25 milyon kes jî hejar in.

Pirsek din a herî wêranker di welat me de, bengdarbûna ciwanan e bi madeyên hişber ku di Îranê de pirsê bengdariyê yek ji sedemên herî bingehîn yê zêdebûna rêjeya telaqê ye. Di civaka Îranê de zêdeyî 2 milyon bengdar bi madeyên sirker hene.

Milî Îrana bin desthilata rejîma Komara Îslamî de, ev du sedemane bandorek pir girîng hebûne li ser têkçûna bingeha malbatan û jihveduveqetiyana ciwanan. Ji aliyek din ve telaq gellek diyardeyên din ên civakî jî diafirîne. Bo mînak bêsepersetbûna zarokan û bêparbûna wan ji soz û rehma dayîk û bavan, ku mezintirîn piştewan in ji bo zarokan. Nemaza di civakên bavserdest û olî ên weke Îranê de zarok zêdetir ji hebûna dayîk bêpar dibin. Çimku ligor yasaya welatên han, ger jin û mêrek jihvedu cuda bibin, berpirsatiya xwedîkirina zarokan dikeve stûyê bav, û dayîk ji zarokê tê dûrxistin û bêparkirin. Eva jî bandorek

nigetîv dixwe ser perwerdehiya zarokan û gellek kêmasiyên perwerdehi û kemilîna kesayeti ji wan re diafirîne. Ji aliyek din ve nêrîna sivik a civakê derheq jinên ku tûşî telaqê hatine, jiyana jinan zêdetir dijwar û zehmetir dike.

herwiha kêmbûn yan heta nebûna sazî û dezgehên piştewanê jinan, jiyana wan di civakê de pir zehmettir kiriye. Çimku di civaka me de navendên wisa bihêz nînin ku piştewaniyê ji jinebî (bêwe jin) nemaze di warê aborî de bikin, lewma jin di civakên han de seba wê ku ne dewlet û ne malbat piştewaniyê wisa ji wan nakin, heta neçar dibin xwefirosiyê bikin û civak ji wan mifaha xirab distîne. Heta jinên ku di dezgehên dewletî yan nedewletî de jî kar dikin, dîsan dikevin ber destdirêjiya cinsî. Ewa jî vedigere ser nêrîna dewlet û beşek ji civakê derheq regeza mê, çimku desthilatdarên rejîma Komara Îslamî bi çavek seksî mîzeyî regeza mê dikin û ewa jî di yasaya bingehîn a vê rejîmê de bi ronî dikeve berçav. Bo mînak rê valakirin ji bo anîna 4 jinan ji aliye mîrekê ve, dana mafê xwedîkirina zarokan bo mêr û rê valakirin ji bo mêrê bona anîna keça 9 salî û... vê rastiye zêdetir me re dide îsbatkirin.

40 Milyon kes li Îranê de hejar in

Piştî nîqaşên zor li ser vê hindê ku gelo di Îranê de, serhejmarîya hejariyê jorê çûye yan daketiye, yek ji berpîrsên Dewletî ku berpîrsê serhejmarîya fermî a dewletî jî ye, ragihand ku di Îranê de zêdeyî 40 milyon kes ji nifûsa 70 milyonî li jêr hêla feqrê de ne.

Pêka rapora "ISNA"yê, serokê Navenda Serhejmarîya Îranê got: Îrorojê seba hebûna bêkariyê, helawsana aborî û hebûna perê zor di bazarê de, pitir ji 10



miloyn kes ji xelkê Îranê ketiye jêr hêla hejariyê û 30 milyon kes jî li jêr hêla hejariya rêjeyî de ne.

Ji 100 beşdarbûyên kurd di taqîkariya zanîngeha Terbiyet Muelim a bajarê Urmîyê de 10 kes tîn wergirtin

Di taqîkariya zanîngeha "Terbiyet Muelim" a bajarê Urmîyê de, bo hilbijartina mamostayên nû, hewil tê dan ku rêjeya wergirtina beşdarên Kurd bihêr kêmkirin.

Li gor nûçegihanîya Kurdistanê, di vê taqîkariyê de ku roja 3'ê Tebaxa 2010'an, di zanîngeha Navenda mamostayên bajarê Urmîyê (Recayî) de hat lidarxistin, berpîrsên vê zanîngehê gelek pirsyarên siyasî û daxwaza karta Besicî ji beşdarên kurdan kirin. Tê zanîn hebûna karta besicî, hilgîrê îmtiyazekê ji bo beşdarên e.

Di beşekî pirsyarên de, li ser PDKÎ û Rêxistinên din ên Kurdî, pirsyar ji beşdarên hatibû kirin. Piştî bi beşdarên Kurd hatiye ragihandin ku wan bi wî awayî ku rejîm dixwaze bersiva pirsyarên nedane. Lewra ji 100 kesan de tenê 10 kes hatin wergirtin.

Rekorda Mirinê!

Îran li warê goriyên bûyerên tirafîkê de, rekordar e



W: Hemîd Muxtarî

Rapora fermî a Navenda Lêkolîna Wezareta Rê, nîşan dide ku Îran li warê hejmara miriyên bûyerên tirafîkî, serweyî welatên cîhanê ye. Bi awayekê ku

di heyamê 14 salan de anku di navbera salên 1993- 2007'an de, 267562 kes di encama bûyerên tirafîkî de canê xwe ji dest dane.

Li gor gotinên berpîrsên hat û çûnê, û herwiha analîzkirina serhejmariyên berdest, li hember her kuştîyekê de, aliyê kêma 10 kes birîndar bûne. Ger em vê serhejmariyê ji xwe re bikin bîngeh, dikarin bibêjin ku di heyamê wan 14 salan de, nêzîkî 3 milyon kes di encama bûyerên tirafîkî de, birîndar bûne. Herçend eva yekemîn car nine ku navendên karnasî derheq vê rewşê, hişyarî yê didin hikûmeta Îranê. Lê eva yekemîn car e ku raporek karnasî tevî data û zaniyariyên hûr ên serhejmarî di pêwendî tevî xesarên tirafîkî di Îranê de çap û belav dibe.

Navenda Vekolîna a Veguhastinê, ku li jêr çavdêriya Wezareta Rê de kar dike û yek ji



navendên herî girîng û cihê bawerî a Wezareta Rê ji warê Lêkolînan tê hesêb, vê dawiyê raporek belav kiriye ku bi terzekî dekomantî, xesarên tirafîkî ên di navbera sala 1993-2007'an, di Îranê de analîze kiriye.

Pêka vê raporê ew xesarên aborî ên ku di sala 2007'an û di encama bûyerên tirafîkî li Îranê ketiye, nêzîkî 18 hezar û 500 milyar dûmen, beramberî 18/5 milyar dolar tê texmîn kirin. Ev rapora herwiha nîşan dide ku Îran di navbera salên 2002-2004'an, pileya duhem li warê kuştîyên bûyerên tirafîkî de bidest xistiye.

Her ev serhejmariya nîşan dide ku di navbera salên 1993-2007'an de nêzîkê 300 hezar kes di encama rûdana bûyerên tirafîkî de, canê xwe ji dest dane.

Pêka serhejmariya belavbûyî, her malbateke Îranî di sala 2007'an de bi awayekî navincî bi qasî yek milyon dûmen ji bo Rûdana bûyerên tirafîkî, tûşî xesarê hatine.

Ev rapora herwiha bas ji vê yekê dike ku xesara 18 milyar dolarî ku tenê di sala 2007'an û di encama bûyerên tirafîkî de ji

welatê Îranê ketiye, bi tenê 33 hemberî **bûdceya** niha a parêzerên rêyên welat, bûdceya afirandina 2 milyon derfetên karî ji bo ciwanan, çêkirina 12 burcên weke mezintirîn burca çêbûyî di welatê Dubeyê de, yan jî kirîna 60 dane ji balafirên "Airbus"ê ye.

Nêrînek bi ser wan serhejmariyan, nîşan dide, ew xesarên ku di encama qewimîna bûyerên tirafîkî li Îranê di heyamê 10 salan de ketiye, beramber e tevî xesarên mirovî ên dewrana şerê Îran û Îraqê.

Beriya niha jî, Elîreza Zemanî, nûnerê meclîsê û endamê Komîsyona Civakî di gotûbêjekê de tevî "mêhr"ê, gotibû: Di Îranê de bûyerên tirafîkî, salane zêdeyî 20 hezar kuştî û 200 hezar birîndar bi cî dihêle ku em dikarin bibêjin salane em şahidê rûdana bûyerekî Sonamî di welatê xwe de ne. Wî herwiha got Îran ji warê miriyên bûyerên tirafîkî, di pileya yekem di astê cîhanê de ye. Eva jî di halekê de ye ku hejmara tirombêlan di gellek welatan de, zêdeyî hejmara tirombêlan di Îranê de ye.



Daxwaza zimanê dayîkî û tepeskririna xwenîşanderên alîgirê Fûtbolê li Tewrêzê

Xwenîşandana aram û bêdeng a Azeriyên alîgirê tîma futbola "Tiraktorsaziye", tevî êrişa memûrên dijî Şoreş a Tewrêzê berbirû bû û bi vê sedemê çend kes hatin girtin.

Li gor Nûçegihaniya "Sawalan Sisî"ê, roja 1^e Tebaxa 2010'an, xwenîşandana han ku di navenda bajarê Tewrêzê û li ser daxwaza alîgirên tîma futbola Tiraktorsaziye, pêk hatibû, zêdeyî 2 hezar kesan tede beşdarî kiribûn, lê memûrên di Şoreş û hêzên Întizamî û motorsiwarên rejîmê bi bikarîna gaza rondkrêj û batoman êriş kirin ser xelkê û bi vî awayî dest bi lêdan û kutana xelkê kirin.

Tê zanîn ev xwenîşandana xelkê bajarê Tewrêzê di encama pişgiriya dewletê ji bêhurmetiyên nejadperestane ên alîgirên tîma Pîrpolîsê bi Azeriyên li dema kêbirkêya futbolê a di navbera tîmên Tiraktorsaziye û


Pîrpolîsê de çêbû. Fedrasyona futbola Îranê piştî bi dawîhatina wê kêbirkêyê, biryara bêparkirina tîma Tiraktorsaziye ji amadebûna temaşavanan û herwiha dana cezayê nextî bo vê tîmê der kir.

Di vê xwenîşandanê de, çalakên sîvil ên Azerbaycanê û alîgirên tîma Tiraktorsaziye bi dana dirûsmên wek: "xwendingeh bi zimanê Turkî", "bijî Azerbaycan", "netewa Azerî bêhurmetiyekî wiha qibûl nake", "em amade ne canê xwe bikin gorî", "em serbazên Babek in" û... nerazîbûna xwe li hember dirûsmên nijadperestane ên dijî civaka Azerbaycanîyan nîşan dan. Tê zanîn, bazariyên bazarên Tewrêzê jî bona nîşaneyên nerazîbûna xwe li hember bêhurmetiyên regezperestên Fars û piştevanîkirin ji xwenîşanderan, dukanên xwe daxistin. Bi gotina şahidên amade di



xwenîşandana roja 1^e Tebaxê, 12 kes ji çalakên sîvil ên Azerbaycanê, ji aliyê memûrên rejîmê ve hatne girtin û îşare bi navê du kes ji wan girtiyan, bi navên, Mihemed Tacdîhî, çalakê sîvil û Ekber Yawerî ji dukandarên pasaja Himet a Tewrêzê kirin. Herwiha li hember çarenivîsa wan girtiyan tu zanyariyek di ber dest de nine. Hêjayî gotinê ye, di mehên borî de, kêbirkîyên tîma futbola Tiraktorsaziye bûye rê xweşker û hêcetek bona baskirina daxwazên netewî û zimanî ên Azeriyên û eva jî bûye cihê nerazîbûna hikûmetê.

FIKR Û RAMAN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Bi hezaran sal e ku (vêga jî gelek civat û civakên kevneşop û paşmayî) hestyariya mêran wekî

kêmanî û serberjêrî, ramîn û fikirîna jinê jî wekî bêsinçî û hetiketiyeke mezin tê dîtin. Bo nimûne: Gava ku lawikekî heft, heşt salî digirî, ji aliyê mezinên xwe ve tê şermezarkirin û biçûkxistin. Û gelek caran jî jê re tê gotin: "Qey tu ne mêrî?" an jî: "Ma tu jin î ku tu digirî kuro!?", "Mirovên mêr nadin girî." Li aliyê din gava ku keçikek neh, deh salî li kûçe û kolanan bi hemsalên xwe yê lawik re dileyîze, jêre tê gotin: "Tu qîz î, şerm e!" an jî ji jineke ku di civata mêran de daxive re tê gotin: "Ev wekî mêran diaxive. Şerm û fedikirin lê nîn e!", "Çi jina bêedeb" û hwd.

Raman, wekî berê erk û fonksiyona ramîn û hizrîna mirov a ku di jiyana civakî de pêk tê, tê zanîn. Ramîn û hizirîn rasterê bi axaftine ve girêdayî ne. Bi awayekî din di navbera ziman û ramanê de rasterê pêwendiyê zexm û qewî heye. Ango, raman di domana kartêkeriya (hevbondoriya) hilberîeriyaya mirov a civakî de pêk tê û diperise. Raman û ziman tu car nikarin bêyî civakîbûnê pêk werin. Ji ber wê ye ku, ji bilî mirov tu heyberên din nikarin biramin û biaxivin.

Raman şewqdana rasteqîniya heyberî (tiştayî) ye. Rasteqînî, bi sehakiyan tê fêhmkirin. Rasteqîniya ramanê li têtgîn, têtgih, daraz û dozîneyan dadigere û di binhişîna mirov de cih digire. Raman bi saya pênc lebatên (azayên) sehakiyê tê hîs kirin û hisîsandin. Perisîn û kemilîna ramanê bi pêçveçûyîn û geşedaniya civakê re bi dest dikeve. Lewre, perisîna lebat û çalakiyên civakî her gav girêdayî pêwendiyê kedê ne. Ked û hilberî li afirîneriyê nû dadigere. Afirîneyên nû jî zimanekî nû diafirînin.

Heta ku lebat û çalakiyên civakê pêçve neçin, ked; û heta ku ked û afirînerî pêşve neçin jî ziman û raman pêşve naçin. Ji bo ku ziman û raman pêşve biçin hewcetî bi pêçveçûna civakê heye. Ziman û raman, bi saya kedê pêşve diçin. Ked û hilberî jî mirovahiyê arasteyî ziman û ramanên nûjen dikin. Ramanên nûjen civakîbûn û gerdûnîbûnê, civakîbûn û gerdûnîbûn jî bêhudûdîbûn û bêdawîbûnê bi xwe re tîne. Di bidestxistina dahênanên (icadên) nû de ziman û raman roleke pir girîng dileyîzin.


Ziman û raman wekî nenûk û goştin. Ne raman bê ziman dibe û ne jî ziman bê raman... Jixwe jiyana bêyî herduyan qet nabe. Mirov tu car nikare ziman û ramanê ji hev û din û biqetîne. Çimkî peydarî û qedirbilindiya mirov rasterê girêdayî van herdu hêmayên bingehîn in. Gava ku mirov ji ziman û ramanê bi dûr bikeve ne tu nirx û hêjahiya wî/wê dimîne û ne jî cudahiya navbera wî/wê û heyberên din

Wekî ku li jor jî hate diyarkirin, rasteqîniya camidî (tiştayî) ango ked û lebat, rasterê ziman û ziman jî ramanê dixuliqîne. Lewre raman ji liv, bizav û çalakiyan pêk tê û dîsa li çalakiyan dadigere. Bi kurtayî ziman û raman her gav bi tevger û bizavên civakî re dikemilîn û li gorî kar û kedê teşe digirin. Kî çî karî dike li gorî wî karî diaxive û dirame. Wekî nimûne: Mirovekî/e karmend wekî karmendekî/ê û mirovekî/e karker jî wekî mirovekî/e karker diaxive û dirame. Her wiha ji ber ku karmend di nav karê karmendiyê û karker jî di nav karê karkeriyê de sehiciye, her yek ji wan derheqa karî xwe de diaxive û dirame. Îcar rastî ne wekî ku mirovên mengîwer (îdealîst) dibêjin "Ji ber ku karmend wekî karmend û karker jî wekî karker fikiriye bûye karker..." A rast, ji ber ku karmend bûye karmend, wekî karmend û ji ber ku karker jî bûye karker, wekî karker difikire. Bi kurtayî, çalakî ji ramanê nayê, Raman ji çalakiyê tê. Bi şeweyêke din, raman çalakiyê naafirîne, berevajî wê çalakî ramanê diafirîne.

Raman û hişmendî herdu jî berhemên mêjiyê mirov in. Mirov jî berê xwezayê ye. Her mirov li derdora xwe ya siruştî, tevî xwezayê diguhere. Raman, şewqdana rasteqîniya jiyana mirov bi xwe ye. Ziman jî navgîna vê şewqdanê ye. Pêwendiyê navbera hilberiyê û ziman, û ziman û ramanê pêwendiyêke bir pergala çarenîna e. Ku hilberî tune be ziman û ku ziman jî tune be raman tune ye.

Bi serê xwe, ne jîrayiya hestî û ne jî ya bîrayî têra stewîn û kemilîna mirov û mirovahiyê nake. Divê herdu jîrayiyên mirovahiyê her gav li nik hev di zik hev de bêne bikaranîn. Qey ku qelsî û lewaziya û jin û mêr; û girêdayî wê kêmaniya mirov ji holê rabe û mirov bibe mirov.

Kaniya Helbestan

Kevirên vemirî tîna min
naşkînin

Axîn Welat

Hemû payiz
li darên te vedilukumin.
pêl bi pêl
xwe didim pêş
û vedikşim..
hêrs û evîna min
di nav destên xwe de
bigre,
yan jî bi min re biherike...

pišta xwe bide min
bibe agir,
bibe birûskvedan..
....

kevirên vemirî tîna min
naşkînin.

du pencerên vekirî
pêjneke dirêj,
û sîtavek..
her ku nêzîk dibe,
dibim lehî,
tevlî te dibim
da ku çemandina me
dirêjtir bibe

hemû biharên min
bi hêla çepê de,
dizivirin,
bi hêla lêvên te de..
hema bîstikekê,
tenê bîstikekê ji xwe
bi ava min de berde,
bila pêlên min di çavên te de
vebrûsin,
û beravên min
di xwîna te de bişkên..
tirej.net

Endamekî PDKÎ di bûyereka dilêş de canê xwe ji dest da

Di bûyereka dilêş û xembar de, Reûf Xetîbî, kadroyê berê û endamê PDKÎ li Hewlêrê canê xwe jidestda **Reûf Xetîbî**, kurê Ebdulsalam, sala 1981 a zayînî di gundê Dulepêsan a ser bi Mehal deşta bajarê Urmîyê jidayîk bû. Navbirî her di roja jidayîkbûna xwe de, diya xwe ji dest da û heya temenê 8 saliyê ji aliyê dapîra xwe ve dihat xwedîkirin. Reûf Xetîbî di sala 2000 a zayîn û di



temenê 19 saliyê de seba hebûna hesta bilid a welatparêziyê, hate nava refên pêşmergeyê PDKÎ. Di destpêkê de di Navebda 3 a Kurdistanê de hat rêxistin, piştê navbirî ji ber destrengîna hunera karîkatorê hate çapemeniya Partiya Demokrat û li wir xebata xwe domand. Heval Reûf Xetîbî di Komîsiyona Çapemenî de weke kadroyekî bişiyar di warê kampiyotê û dîzayna rojanma "Agirî" û "Kurdistan"ê de xebata xwe dimeşand. Navbirî di sala 2009'an de li bajarê Hewlêrê akincî bû û di teşkilata eşkere a Partiya Demokrat de hat sazmandan û erkê xwe ên welatparêziyê di domand.

Mixabin Reûf Xetîbî roja 21'ê Tîrmeha 2010'an, di bûyereka dilêş li bajarê Hewlêrê de canê xwe ji dest da. Termê navbirî di goristana Şehîdên Navenda 3 a Kurdistanê li Cêjnîkanê de teslîmê axê hat kirin û tevî karwanê Şehîdên Kurdistanê bû.

Riha wî şad û rêya xebatê bo gihîştin bi azadiyê pir rêvîng be.

19 car zewiciye û dixweze jina 20'ê jî bîne

Zilamekî 61 salî piştî ku 19 car zewiciye, niha jî dixweze jina 20'ê bîne, lê vê carê bûye evîndarê hunermenda mezin a welatê xwe Yusra.

Nêçîrvanekî Misrî yê bi navê Hacî Mitewelî heya niha 19 jin aniye



û 15 ji wan berdaye (Telaq daye), 49 zarok û 114 nevi hene, lê niha dixweze cardin bizewice û jina 20'ê jî bîne.

Lê jinanina vê carê ya wî pir heybetî ye, ji ber ku ew bûye evîndarê keça hunermend a bi navê deng ya Misrê Yusra û ji ber wê jî navê keçeke xwe daniye Yusra.

Avestakurd

Osman Baydemîr: Em daxwaza hikûmeta Otonom ji bo Bakûrê Kurdistanê dikin

Osman Baydemîr, Serokê Şarevaniya bajarê Diyarbekirê, daxwaza hikûmetek Otonom ji bo Bakûrê Kurdistanê û bilindkirina alaya Kurdistanê li



kêleka alaya Tirkîyê kir.

Li gor rapora "Rewa News"ê Osman Baydemîr li dehemîn ahenga siroşt û rewşenbîriyê di Tuncilî de da zanîn, pîrsa Kurd ji rêya avabûna hikûmetek otonom di Bakûrê Kurdistanê de dê were çareserkirin.

Herwiha Baydemîr ragihand: Kurd jî divê weke netewa Tirk bibin xwediyê Parlamenê. Navhatî herwiha got, çê dibe rojekê alaya Kurdistanê jî li kêleka alaya Tirkîyê li ser binayê şarevaniya bajarê Diyarbekirê were hildan.

Hêjayî gotinê ye ku parlamantarên Partiya Aştî û Demokrasiyê jî di galaleyekê de ku pêşkêşî Parlemana Tirkîyê kiribûn, daxwaza pêkanîna 22 herêmên otonom di Tirkîyê de kiribûn.

Xamîneyî:

Pêşxistina muzîkê dijberî armancên sîstemê ye

Xamîneyî, rêberê Komara Îslamî a Îranê ragihand ku pêşxistina muzîkê bi armancên rejîmê re dijber e.

Lê karnasên siyasî li ser vê bawerê ne ku Xamîneyî bi derkirina fetwayên hankî, dixwaze civata meleyên sunetî ji xwe razî ragire. Çimku niha Xamîneyî tenê di nava vê civata melayan de pêgeh û alîgir heye.

Radyo Firansayê jî her di vê derbarê de ragihand: nûçenameyekî xwendkarî a ser bi besîcê, li van rojane



nameya besîcekê ji bo Xamîneyî çab û belav kiriye ku têde ciwanekî 21 salî tevî îlankirina vê yekê ku pîr hez ji hînbûna "tar"ê dike, daxwaza agahdarbûn ji nêrîna rêberê rejîma Îranê dike. Di bersiva namê de, Xamîneyî ragihandiyê ku herçed lêdana mozîk û pêşxistin û pêkanîna kilasên hînbûna muzîkê helal e, lê tevî armancên bilind ên rejîma Îslamî li Îranê yek nagire.

Lê karnasê siyasî li ser vê bawerê ne ku ger tiştêk ji aliyê olî ve helal be, tu kes nikare xelkê neçar bike ku dest ji encamdana wê berde. Bi raya karnasan heya niha tu melayekê lêkolînek micid li ser muzîkê encam nedaye.